

Saziya Mafên Mirovan

a Kurdpa, ew pêwîstiya ku
diviyabû em lê mikur bèn

»»» R:7



Tirajîdiyayekî
mirovî di rê de ye

»»» R:3



Birsî bihêle û
bike kirêgirtiyê
xwe!

»»» R:4



Rojavayê
kurdistanê li ber
man û nemanê
ye

»»» R:8



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (381) 07-09-2020 Buha (1000) Tûmen

“Na” gotin bi rejîma Îslamî ya Îranê

17'ê Xermanan bo gelê Kurd rojeke xembar e ku dibe li dîroka şoreş û berxwedan de bê nivîsîn da ku nîfş li pey nîfşên wê nîştîmanê ji hovîtiya dagîrkerekê bizanin û aghdar bin ku dagîrker çendîn milyon Dolar pare terxan kir ku tirsê di dilê şoreşvan û azadîxwazan de biafirîne, lê serê wê li kevir kevt!

Çend çirke, çend xulek, ji demjimêr 11 a 17'ê Xermanan a sala 1397'an zû derbas bû, esmanê bajarê Hacî Qadir saf û şîn bû, şîn û saf wekî dilê xweşik yê Pêşewa; Malbatên Demokrat mijûlî jiyana xwe bûn, di nav yek ji wan malan de dayîkek li cem landika zaroka xwe ya sava rûniştibû, ew zarok digel “lorî lorî”ya dayîka xwe dikiya; lê ji nişkêve hemû tiştêk têk çû, girmînek hat, bû du, sê, û... Dûkeleke reş esmanê Koyê girtibû û Heybetsultan veciniqî, û toza xurbet a salên zû yên deşta Koyê xwe kir bi ser hewa de, û rojeke tal û tarî ji dîroka Kurdistanê, xwe tomar kir. Hate zanîn ku Fêrgeha Serwan Çeko bûye armanc! Dinya mat û bédeng bû, û çi dengê nedihat, di wê demê de

mûşeka tirsînok a Tehranê kevtibû xwarê, û du xwendevanên emegnas yên Demokrat, du mamosteyên xwendîngeha azadiyê bûne armanc.

Şehîdên vê carê yên Kurdistanê Muxtar Qadîrpûr û Faruq Hesen Xeyat bûn, ku bi pêkenînen xwe yên hêvîbexş bûne rêvîngên heta-hetayî, û çûne cem meşxelên Rasanê.

Eva ku xevna Tehranê bû nehate cî; wan dixwaşt bi şandina mûşeka xwe ya tirsînok, tirsê bêxin nav dilê şoreşvanên rêbaza azadiyê, lê ew bi xwe bû “pend”ê rojgar, û tirsê wan ji Kurdan bo cîhanê eşkere bû.

Di heman demê de jî, li 21'ê Xermananê tenê 4 roj piştî êrîşa dirindane ya Cemarî, eva Kurdistan bû ku bi bédengî rabû ser pêyan, û li beşeke mat a Kurdistanê, kîna dagîrker kir bin axê de, heta ku bêjine wan, “Ne”gotina me herçend bi bédengî ye, lê di nav hundirê me de ye û 39 sal cinayet û xiyaretê nekariye netewa Kurd teslîm bike. Her di wê rojê de rejîma tawanbar û cinayet

etkar deşt avête îdamkirina çend ciwanên Kurd. 17'ê Xermananê bîranîna çend xalan hewce ye, ku bi vî wî awayî ne:

1-Rejîm bo xwe vedizîn ji krîzên ku ser hev de bibûne kelek, hewil dida li derveyî sînore cugrafiyaya xwe, şer û fitneyeke nû biafirîne.

2-Çavtirsandina xelkê navxwe û yên deverê.
3-Rejîm Kurdan bi

welatên derekî û kom û komlên bi berçav mafê mirovan derheq vê cenayeta nû, mixabin heya niha pêşbîniyeke şaş nebûye.

5-Bikaranîna mûşekê li dijî Partiya Demokrat, vê yekê dide zanîn ku rejîm li hember Rasanê de zelîl e.
6-Roj li pey rojê, şerên deverê ku rejîmê roleke nerênî tede lîstîye kûrtir dibe, û rejîmê bo dilxweşkirina

şermezar kir. Lewma di dawiyê de hewce ye em hemû vê yekê bizanin ku di 21'ê Xermanan de, beşeke zêde ew hêvî û xeyal û xevnên rejîmê bûne bilqên ser avê, û rejîm di Rojhilatê Kurdistanê de şikesteke bê mînak xwar.

Xelkê Kurdistanê bi daxistina dikan û bazarên bajar, ber bi banghêjiya Partiyên Rojhilatê ve hatin, û bi rohnê dengên xwe



bizwêner û rêxerê guherînkariyên paşeroja Îranê dizane, û dixwaze piştî vê ku pîrsgirêk, hikûmetê bi gîştî bêxin metirsiyê de, netewa Kurd û hêzên Kurd lawaz bike.
4-Pêşbîniya rejîmê derheqê bédengiya

caşan û hêzên girêdayê xwe hewcehî bi wiha manorekê hebû.

Her çawa hate baskirin tenê çar roj piştî cinayeta rejîmê, Kurdistan yekdeng rabû ser pêyan, û bi bédengiyê watedar tewawiyeta rejîmê

bi siloganên “Na bo îdam” û “na bo mûşekbaran” û “na bo bînpêkarî” û “na bo komara Îslamî” li dijî rejîmê bilind kirin û car din nîşan dan ku rejîm xwediyê ti pêgeh û rewatiyeke xelkî di Kurdistanê de nebûye û nîne.

Sergotar

Dagîrkirin

N: Kerîm Perwîzî

Di guherinkariyên rewşa hewayê de, hindêk cih êdî bo jiyankirinê nabin, yan jî wan cihan de pir dijawar dibe. Bi vî awayî mirov koçber dibin û cihên jiyankirina xwe diguherin. Bi dirêjahiya dîrokê, mirov û civatgeha mirovayetiye di guherîna cihê mana xwe û koçberiyê de bûne, û gellek caran ev koçberên bikom, şer û kuştin li pey xwe hebûye, wate şer di navbera wan û xelkê xwecihî de, ku xwdiyên rasteqîn ên wan cihan in!.

Koçberî dema ku digel diyardeyekê bi navê Koloniyalîzmê têkel dibe, him xwînrêjî û him hovîtiya zêdetir û him jî tune kirina netewan li ser nîştimana wan, li pey xwe tine.

Di wan rojan de berpîrsê Dezgeha Daristanên Îranê ragihand ku zêdetir ji 30 milyon hiktari erdê Îranê dibin deverên çol û hişik. Li cihekî wekî Îranê jî ku deverên “kewîr”î hene, bûna wan bi çolatî, wisa dike ku ti derfetek bo jiyankirinê di wan deveran de nemîne, û di çend salên derbasbûyî de deverên navendî yên Îranê hêdî-hêdî mijûlî bicihhêlana cihên jiyana xwe ne.

Deverên navenda Îranê dema ku rastî hişikbûn û şewitandina deştan hatin, bû sedem ku xelk ber bi deverên çiyayî û hindêk deverên hêniktir ve herin, ji aliyekî din ve jî, rejîma Koloniyalîstî a Îranê, deverên wek Kurdistanê di siyaseta stratejîka xwe de bi deverên sor an metirsîdar nîşan kiriye, ku dibe bi guherîna heşîmetê, wê metirsiyê kêmî bike. Di wan salên dawiyê de, bi

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê kombûnek lidar xist



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران

Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.

مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

Roja Sêşemî, 1ê Îlonê, Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê bi banghêjiya Partiya Demokrat a Kurdistanê, kombûnek hate lidar xistin.

Di wê kombûnê de, ku Sekreter û kesên yekem yên Partiyên pêkhêner yên Navenda Hevkariyê jî beşdarê wê kombûnê bibûn, û ji aliyê Heyeta Partiya Demokrat a Kurdistanê ve pêşewazî ji wan hate kirin, piştî pêka destûra kar kombûn dest pêkir.

Piştî Sekreterê Giştî yê PDK, “Xalid Ezîzî”, bi îşarekirin bi mijarên ku di destûra kar ya kombûnê de hatibûne danîn bas kir, û kombûn lidar xist û beşdarên kombûnê û bi taybet kesên yekem yên Partiyên bi hûrdekariyan gotinên xwe pêşkêş kirin.

Ew basane ku bi giştî pêwendî bi çalakî, hereket û dîdgeha Navenda Hevkarî derheq çend mijarên pêwendîdar bi Îran û Kurdistanê bûn, tevî şirovekirin û hevdengiya endamên Navenda Hevkariyê, biryarên hewce li ser dan.

Piştî gengeşeyên dawî ji aliyê “Xalid Ezîzî” ve, berprsayetiya Navendê ji aliyê PDK ve bi Komeleya Zehmetkêşan a Kurdistanê hate spartin.

hezaran karmendên îdareyên curbicur yên Spaha Pasdaran û dezgehên ewlehî û ...hwd, ji xelkê deverên navendî yên cugrafiyaya Îranê ku bi piranî Fars in, bo Kurdistanê vediguhêzin, û di bajarên Kurdistanê de ku çend sal berî niha tek û tûk kesên netewên din tê de peyda dibûn, niha bi hezaran kesên Fars tê de niştecîh kirine. Ew her ew siyaseta serdemê Qacar û piştî siyaseta Rizaxanê Mîr-penc e ku li dijî bajarê Kirmaşan di Kurdistanê de kirine, û xelkekî zaf ji Farsan tede cihgîr kirin.

Kurdistan di wan salên dawiyê û salên bê de, rastî siyaseta dagîrkirineke din bûye, û dixwazin ne tenê cuxrafiyaya mirovî ya Kurdistanê biguherin, belkî dixwazin bi vî awayî, zimanê axivtina xelkê bê guhartin, û êdî axavtin bi Kurdî bibe parek ji dîrokê.

Tirajîdiyayekî mirovî di rê de ye



N: Nûredîn Sofîzade

Di destpêka sala nû ya xwendinê de, di Îranê de kê berpirsyarê rewşa tendirustîya qutabiyane?

Herwekî hemî aliyek agehdar e gorî adet û biryara cîhanî wan rojan an ku hemî salê di destpêka meha Îlonê de, di seranserê cîhanê de deryên qutabxanan vedibin û qutabî bona destpêkirina pol û qonaxekî dinê û salekî din ji wergirtina perwerdehiyê berê xwe didine qutabxanan.

Herwekî hemî kesek agehdar e îsal di demekê de deryên qutabxan vedibin ku derd û vîrûsekî kujer û cihê tirsê seranserê dunayê girtiye û mixabin heya niha gelek qurbanî jê kevtine û niha jî ne tenê dawî pê nehatiye û dermanek bo çareserîya wê nesaxiyê nehatiye çêkirin, belkî roj bi rojê belavtir dibe û di hinek welatên ku guh nadine rênimayiyên xweparaştinê, hejmara kesên ku wê vîrûsê dikevin zêdetir jî dibe.

Îrana belavlêdayî ya me jî yek ji wan welatana ye û mixabin ev vîrûse rojane qurbanîyan diştine.

Di rewşekî wiha de ku gorî gotin û ragihandina xwedê demûdezhê û berpirsên rejîmê, rojane di Îranê de hezaran kes bi wê vîrûsê dikevin û sedan kes canê xwe ji dest didin, rejîm her bixwe radigehîne ku nêzîk bi hemî Îranê di rewşa sor a Koronayê de ye, lê di hember de rejîmê ti rênimayîyeke xweparaştinê nade xelkê, rejîm di ragihandinan amaran de direvan dike û raştiyan jî xelkê diveşêre, heya niha ti

alîkariyekî madî û dabînkirina hewcehiyên xweparaştinê nedaye xelkê, rast di wê rewşê de têt û deryên qutabxanan diveke.

Deshilatdarên rejîma Îranê hevdem digel vekirina qutabxanan, ragihandine ku di hember tendirustîya qutabîyan de, xwe berpirsyar nizanin.

Pirsyar eva ku berpirsê vekirina qutabxanan, çima nabe xwe di hember tendirustîya

bikutin, her bixwe li ber xweparaştinê amade nîne gorî adetê hertimî di yek ji qutabxanan de amade be û zenga qutabxanê bikute. Di wê navberê de çi erk û berpirsariyek dikeve ser milê dayîk û bavê qutabîyan? Di demekê de ku rejîm xwe berpirsyar nizane li hember canê zarokên we de, eva erkê dayîk û bavane ku hindî bikarin bona paraştina can û silametiya zarokên xwe, wan neşînine qutabxanan. Hekî zarok saleke xwand-

hêlin kes destê xwe lêde, yan digel hevalên xwe biguherin. Divê dayîk û bav, bêjne zarokên xwe ku ji îmkantên giştî mifahê vernegirin û bi taybetî ji ava giştî vexwarinê xwe biparêzin û divê di amaneke taybet bixwe, avê ji malê gel xwe bibine qutabxanê.

Dema ku ji qutabxanê vedigerine malê, berî evê ku bêne jorde, hewceye dest û devûçavên xwe bi sabûnê bi paqijî bişûn.

Hemî cîhan dizane ku rejîma Komara Îslamî her bixwe sebebkarê sereke yê belavbûna zêdetir a vîrûsa Koronayê bûye, lewma ew şik û gumane heye ku rejîm bi tûşkirina zarokan bi vîrûsa Koronayê, tirajîdiyayekî mirovî di Îranê de biafirîne.

Hekîne renga di zaf welatên cîhanê de di demsala çaxê vebûna qutabxanan de, deryên qutabxanan vekin û sala nû ya xwendinê dest pêbikin, lê cudahiya wan welatan di vê navberê de digel rewşa qutabîyan di Îranê de eva ye ku, heçî kîjan ji wan welatan ku biryara vekirina qutabxanan didin, di hember de jî hemî berpirsariyekê dikêşînine stuyê xwe û hemî hewcehiyên weke tiştê xweparaştinê bo qutabîyan amade dikin, û hemî rênimayîyekê dide qutabîyan û hêsankariyê bo wan dike, û dewlet weke dayîk û bavên zarokan xema silameti û tendirustîya zarokan de ne.

Herçiqas îsal sala nû ya xwendinê di rewşekî cihê nîgeraniyê de dest pêkir, em hêviya silameti û tendirustî û dûrbûna ji heçî nexweşiyekê bo zarokên Îran û bi taybetî zarokên Rojhilatê Kurdistanê dixwazin.

Ez hêvîdar im ku heçî dayîk û bavek bi berçavgirtina tendirustîya zarokên xwe çiya baş e wê bikin, û hêvîdar im ku poşmanî bi dû de nebe.



qutabîyan de berpirsyar bizane?

Di wê navberê de kê berpirsyarê silameti û paraştina qutabîyan li hember vîrûsa Koronayê ye?

Berpirsên rejîmê gelek baş dizanin ku dê çi biqewime û çi pîlanek darêtine ku karesateke mirovî bête pêş. Gelek ji pizîşkan û xemwarên canê xelkê û bi taybetî qutabîyan nerizayeti û nîgeraniya xwe dane xuyakirin, ew baş dizanin ku di despêka sala nû a xwendinê de, hegera karesatekî mirovî di Îranê de heye.

Hesen Rûhanî yê Serkomarê rejîmê di demekê de wê biryarê di pişt deryên dayêxistî û bi çavê kamêrayan xelkê agehdar dike û daxwaz dike ku zenga Qutabxanan

inê pare bimîne, gelek ji wê hindê baştir e ku tendirustîya wan bikeve ber tirsê. Heçî dayîk û bavek ku zarokê xwe bişîne qutabxanê, dibe gelek bi zelalî wan rênimayî bike da ku xwe biparêzin.

Divê di wê rewşa xirab a aboriya ku xelk tê de ye, hewcehiyên xweparaştinê bo zarokên xwe dabîn bikin, weke lepik, mask û jêlê û isiriya paqijkirinê, û nabe çavnhêr û benda rejîmê bin ku wan hewcehiyan dabîn bike.

Divê zarokan rênimayî bikin ku hindî dikarin xwe ji qutabîyên dinê dûr bigrin û xwe ji dest lêdan û maçîkirinê biparêzin. Divê bêjne zarokên xwe ku bi çi awayekî hewcehiyên xwe yên xwendinê yên weke, pênûs û defter û pirtûkan, ne-


Birsî bihêle û bike kirêgirtiyê xwe!



N: Dara Natiq

Rejîma bi nav Îslamî ya Îranê her di deştpêka deshîlata dîktator û mirovkujane ya xwe de, siyaseta bîrsîkirina civatgeha Îranê bi giştî û Rojhilatê Kurdistanê bi taybetî bi merema neçarkirina xelkê û girêdana wan bo nava dam û dezgehên serbazî û ewlekariyê berdewam dike. Rejîma Îranê di heyamê zêdetir li 40 sal deshîlatdariya xwe, bi awayên cur bi cur hewil dide ku xortên kurdîstanê û bi taybetî ciwan û jinên civatgehê bi giştî girêdayî navendên xwe yên serbazî û sîxurî bike. Dagîrkerên kurdîstanê û yek ji wan rejîma dagîrker a Tehranê hertim ji du nîfşên civakê û nemaze nîfşa ciwan û jin pir ditirse û disilike. Siyaseta deştemokirina genc û jinan siyaseta deştemokirina tewahiya civakê ye ku bi dirêjahiya dîrokê dagîrkerên Kurdistanê û nemaze rejîma Tehranê berdewam meşandiye. Bo vê meremê dewletê ji bo ku derfeta bîrkirin û hizirkirinê ji gencan bişîne, ji aliyekê ve siyaseta bîrsîkirinê û ji aliyekê din ve jî siyaseta tûşkirina civakê bi madeyên hişber û mûitadkirina ciwanan girtiye pêşîya xwe. Her di çarçoveya vê siyaseta han de siyaseta serbazîkirina bi zorî û bi rêxistinkirina ciwanan di nava navendên leşkerî û îtila'atî û emniyetî yên weke besîc û Spaha Pasdaran de bi rê ve dibe. Ji aliyekê din ve jî piroseya bi navê "sîxe"kirina jinan bi merema girêdana wan bi gencên bikirêgirtî yên xwe ve yek ji wan siyasatên herî qirêj yên rejîmê ye bo bêiradekirina du nîfşên pêşeng û bi bandor yên lawan û jinan di civakê de. Navendên xwandin û per-

werdehiyê di Îranê de bûne bi cihê bi rêxistinkirin û neçarkirina ciwanan û tevlîkirina wan bi navendên serbazî yên weke "Besîc" û navendên sîxurî û eskerî yên rejîmê. Rejîm bi awayên cur bi cur û ji rêya gef û hereşekirinê û bi zorê wan neçar dîkin ku dibe xwandekar bibin endam di rêza "Besîc" û navendên eskerî û bi hêza leşkerî û sîxurî û tepeserkar ya wî welatî re bibin bi alîkar û werin bi rêxistinkirin. Her di doma wê siyaseta han de, navendên "besîc" û "Spaha pasdaran" di çend rojên borî de û li gor rapora malpera navendî a PDKÎ a bi navê "Kurdîstan-media", di devedevê vebûna xwendîngeh û navendên perwerdehiyê di Kurdistanê de, Spaha terorîst a Pasdaran, di bin navê alîkarîdan bi xwendevanan re, daxwaz ji wan kiriye ku piştî vergirtina pere, dibe serdana binkeyên besîc bikin û navê xwe di wir de bidine nivîsandin. Her li gor rapora han, di heyamê çend rojên derbasbûyî de, di bajarê "Şîno"yê ya Rojhilatê Kurdistanê de, Spaha terorîst a Pasdaran paketên naman birine ber derê malên xwendevanan ku di wan paketên nameyan de, kartekî bankî ya 300 hezar tûmenî û formek hebûye. Piştî, bi malbatên wan xwendevan re ragihandine ku dibe piştî vergirtina namê û karta bankî, serdana binkeya besîc a



wî bajarî bikin û navê xwe, bidin nivîsandin. Her sal rejîma Îranê, di dema vebûn û deştpêkirina xwendîngehan de, hejarî û deskurtiya xelkê bi derfet dizane û dixwaze bala xwendevanan bo aliyê xwe ve rabikêşe û wan bike endamê demûdezhgehên xwe yên terorîstî. Pêka zaniyariyên belavbûyî, berê jî, di formekê de ku dabûn xwendevanên Îranê, daxwaz ji wan kiribûn ku, li ser cor û modela mobaylê û kampiyûtera dayîk û bavên xwe hin zaniyariyan binivîsin. Ew kiryarên rejîma Îranê, di demekî de ne ku bi rûyên cuda, cehd li ser kultûra sîxurîkirina endamên civakê di derheq hevdu, berfireh bibe û bi wî awayî, dengê nerizayetî û kesên dijî xwe, bi wê rêyê ve tepeser bike.

Asimîlekirin û tune kirina kurdan, komkujî û girtin û eşkencekirina gencan, wêrankirina bingeha aborî ya kurdîstanê, jinavbirin û nehêlana derfetên karî, belavkirina madeyên hişber û mûitadkirina civatgeha Îranê û Kurdistanê bi giştî û li serweyê hemûyan jî siyaseta bîrsîkirina civakê û bi hejarkirina roj bi roj a civakê, di pêxema bê îradekirina civakê ye û ji bo ku derfetên bîrkirinê nemaze ji nîfşa nû a civakê û lawan û jinan bişîne û wan neçar bike ku ji bo bijîva jiyana xwe tevlî navendên sîxurî û leşkerî yên wê rejîmê bibin.

Spaha terorîst a Pasdaran jî li wê rewşa xirab a jiyana xelkê û li hejarî û belengaziya xelkê bi merema armancên biyomên xwe mifah werdigre û wan neçar dîkin ku li hember pereyek biçûk ji wan re alîkariyê bikin û îradeya bîrkirin û xwenasînê ji wan bişîne û dengê azadîxwazî û mafxwazî a xelkê Îranê û Kurdistanê bi taybetî di bingehe de bifetisîne.

Nebûna azadî, serkut û zexta zêde ya li dijî kêmaniyên olî û mesebî, serkut û şikandina neteweyên xeyrî Fars, û talana çavkaniyên avî û bin erd ên herêmên derdora Îranê, û ştemên bêqas ên din li dijî xelkê Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî, û arîşeya aborî û bi sedan arîşe û bêdadiyên ku di civakê de roj li pey rojê zêde dibin, raştiya han nîşan didin ku êdî temenê wê rejîmê bi dawî hatiye û ew nikare wan arîşeyên heyî modîriyet bike, herwisan hewceye bêjin ku ew nikarin bo heta hetayê xelkê bixapîne û dengê mafxwaziya xelkê bi wan karên xwe yên xapîner bifetisînin.

Tevgera Rizgarîxwaziya Neteweyî, Derfetek Bo Jinên Pêşeng



N: Serbest Urmîye

Berçaviyeke balkeş ku îro pitir di komên rewşenbîriyê de weke faktereke girîng jê tê mêzekirin, beşdariya siyasî yan beşdarbûn di siyasî de ye. Bi terzekê ku weke xaleke girîng a pêşdeçûnê hesab tê kirinê û lawazî yan nebûna beşdariya siyasî bi taybetî beşdariya jinan di siyasî de weke kemasî û nîşana paremayiyê di bizav yan sîstema dewletdariyê de welat de tê zanîn. Lê beşdarî di siyasî de yan beşdarbûna siyasî di terzên cuda de hatiye şirovekirin û raman û pênaseyên cuda li dor wê hene.

“Myron Weiner” siyasîvanê Emrîkî, beşdariya siyasî wiha şirove dike” kiriyareke dixwaze ku bandor hebe li ser hîlbijartina rêberên siyasî û siyaseta birêveberiya giştî di hemû hêlên desthilata neteweyî yan herêmî de, îcar serkevtî be yan na, rêkxistî be yan dîr be ji rêkxistinê, demkî yan berdewam be, ji rêya rewa de be yan na. Rexneyek ku li şiroveya “Myron Weiner, tê girtin eva ye ku tevalî nine, belkî tenê aliyê beşdariyê dide xuya kirin (hîlbijartin).

Ji aliyê din ve “Lester W. Milbrath” dibêje: Beşdariya siyasî reftareke bi bandor e yan di hewlê de ye ku bandorê li ser encamên kiriyarên hikûmetê danê.

Her di derheq beşdariya siyasî de” Sumuel Huntington” û “Jean Nelson” li ser wê baweriyê ne ku beşdariya siyasî hewlek e ji aliyê şaromendên sîvîl ve ji bo ku bandora wan li ser siyaseta

giştî ya welat de hebe.

Di vir de mebest balkeşandine bi ser beşdariya jinan di tevgera siyasî de. Di vê deheqê de ji hin pisporên vê biyavê di navbera tevgera siyasî ya jinan û beşdariya jinan di tevgerên siyasî yan siyaseta giştî de cudahiyeke dibînin û li ser vê baweriyê ne ku tevgera siyasî ya jina dibe weke xwe bikeve biyava siyasî de û dibêjin ku tevgera siyasî ya jinan demekê dikemile û wateya xwe ya rastîn werdigire ku xwerisk, bi kom, xwedî rêkxistin û îdeolojiya taybet bi tevgera jinan be. Berevajî vê jî hene ku dibêjin ev hizra han di bin sîbera femînîzmê de geşê dike û beşdarî di siyasî de bi terz û forma giştî de nabe ku ji hev were veqetandin. Herçend ku tevgera jinan dikare him weke tevgera siyasî be, him jî tevgera sîvîl, lê di terzê sîvîl de êdî nikare weke beşdariya siyasî were hejmartin.

Jinên Kurd û Beşdariya Siyasî

Ya ku di Kurdistanê de tê dîtin, renga berevajî welatên derdor yan Rojavayî be. Jiber ku di Kurdistanê de heyameke dirêj e ku tevgera siyasî di çarçoveya tevgera rizgarîxwaz û bizava çekdarî de xebatê dike û bindestiya neteweyî û hewildan ji bo bideştveanîna azadî û mafê çarenivîsê delîvên pêkhatina rêkxistinên siyasî bûne. Wate rêkxistinên siyasî rêveberiyên tevgera rizgariya netewî kirine û dikin. Di vê navberê de jî jinên Kurd weke beşek ji civaka Kurdistanê hertim weke karakterên şoreşê yan bizava rizgarîxwaziya neteweyî derketine yan em bêjin xwe derxistine. Lê ya rast eva ye ku berfirehbûna sîstema neteweyî û nebûna azadiyên siyasî, civakî, çandî û ...hwd, di Kurdistanê de, rola xebata çekdarî pêş xistin û erkeke giran dane ser milê takên xebatkar ên Kurd ku jinên Kurd jî bêpar neman. Lê serbarê cangorîtiyeke zêde,

rolê jinan gelek caran di hêla pêşve ya xebata çekdarî yan pîştewaniya tevgera çekdarî de dihate ditin û siyasî heta qaseke zêde di meydana mêraniyê de bû. Di vê qonaxê de beşdariya jinan her çend bê bandor nebûye, lê bê lome jî nemaye. Beşeke zêde ji çalakvanên jin vê gazindê dikin ku beşdariya jinan di tevgera siyasî û rizgarîxwaziya Kurdistanê de derfeteke wisa ji wan re nehiştiye ku pirsê jinan di Kurdistanê de weke hewce were baskirin û tevgera jinan weke tevgera ser bi xwe û xwedî rêkxistina taybet geşê bike û xwestekên jinên Kurd bide nasandin.

serbixwe ya jinan tîr bas û gengeşekirin, lê ew yek nebûye sedem ku beşdariya jinan di tevgera siyasî û rizgarîxwaziya neteweyî de were astengkirin. Belkî beşdariya jinan di tevgera rizgarîxwaziya neteweyî de derfeteke din daye pêşiya wan ku pirsê wekheviyê û nîşandana hêz û şiyana jinan di çepereke din de jî were selimandin.

Ji aliyê din ve jî ji bizava siyasî û rizgarîxwaziya neteweyî weke çeperekê ji bo paraştina keramet û geşekirina hêz û kesayetiya ser bi xwe ya jinan di hem-



Piştî avabûna Komara Kurdistanê di sala 1946'an de, yekemîn rêkxistina taybet a jinan bi merema geşekirin û beşdarkirina jinan di karûbarê siyasî û civakî de ava bû. Di hemû temenê Komara Kurdistanê de bi xasmanî jî ji aliyê Serkomarê Kurdistanê ve zêde cehd li ser beşdariya jinan nemaze di pirsên civakî de dihate kirin. Niha jî herçend ku jinên Kurdistanê bûne xwedî rêkxistinên taybet û aliyên siyasî, civakî, çandî û ... yên wan di çarçoveya bizava

ber sîstemên civakî yên bi sedema kevneşop, oldarî û sîstema dagîrkariya dewletên dagîkkerên Kurdistanê de, tê mêzekirin. Beşdariya berfireh a jinan di astên cur bi cur de nemaze di sîstema rêveberî û navendên siyasî yên partiyên siyasî yên Kurd de, him bandora jinan li ser pêşdeçûn û geşekirina xebata neteweyî da xuyakirin, him jî derfetek din afirand ku jinên Kurd bidin selimandin ku dikarin bibin pêşeng di avakirina civaka siyasî û exlaqî de.

Ev Xopan Ji Wê Xapandinê ye?



N: Mihemed Hesko (birasoz)

“Divê serî beriya destan werin biçekkirin”
Meksîm Gorkî

Erê, ji roja bin rojê de, em di şer û cengeke giran ya man û nemanê de ne, lewra divê û pêwîst e ku em girîngiyê bidin bi bihêzkirin û dewlemenkirina hiş û serî, ji ber ku zanîn û nasîn take çarere ye ji bo xweparastin û rizgarbûn ji metirsiya nemanê, herwiha ji bo pêkanîn amancên rewa, ji ber ku hiş û hizir canên azadiyê ne, û ji roja bin rojê de, ji ber hevrikiyên xwînî û nakokiyên demdirêj jî di navbera gelan de peyda bibûn, ew jî bi ber çavnebarî, çavtengî û hovberiyê bû, jiber ku wek Nîtsê dibêje: “Her û her pirs pirs bihêzbûnê bû, û ne pirs mafbûnê bû”.

Di vê pêvajoya xwînî û hevrikiya hovane de, hemû cûrên çekan dihat bikaranîn û çeka herî bibandor û xwedî roleke bihêz, çeka rewîşt xapandinê bû, jiber ku (şer û ceng, xapandin e) wek tê gotin, û mixabin gelê herî baca vê çekê dayî gelê Kurd e, ji ber ku Kurd di qada şerê rûbirûyî de lehengên bê hempa bûn û tucarî di qadên şeran de qels û lawaz nebûn û bi mîrxwasî şerdikirin, li hemberî vê wêrekî û lehengî yê, neyar û dijminên Kurdan bi zêrekî çeka xapandinê bikaranîn e, di vê derbarê de Basîl Nîktîn dibêje: “Gelek zehmete ku kesatiya Kurdî bi hêzê û tundiyê were jêrbakirin”.

Pêvajo û dîroka xapandinê dîr û dirêj e, û mixabin her tê dubar û sêbarekirin çî xapandina bi armanca kuştina rêber û kesatiyan be, ji Ebo Muslim El-xuresanî yê ku dewleta Emewîyan li Şamê

hilweşand û dewleta Ebasiyan di sala 750, z li Bexdayê damezrand ve bigre, ta sedsala nozdehan û sedsala bîştan piroseya kuştina rêber û simbolên xebata gelê Kurd berdewam e, mînak (Simkoyê Şikak, Şêx Se`îdê Pîran, Dr.Qasimlo û Dr. Şerfgendî) û gelek kesatî û serkirdeyên din ku bi çek û rewîşt xapandinê hatine şehîdkirin, daku çavên gelê Kurd bitirsînin û Kurd bimîne bindest!

Lê kambaxtirîn û xeraptirîn cûrên xapandinê, xapandina hizrî û ya ramanî ye, û ew jî bi darê zorê bi ser gelê Kurd de hatiye sepandin, û ev cur bi xiraptirîn awayên dagîrkeriyê tê zanîn, jiber ku gelek bibandor e û bixwe kiryara mejîşuştinê ye û dûrxistin e ji çanda neteweyî û xizmetkirin û pîrozdtîna çanda neyar û dagîrkera ye, û derencama vî cûrê xapandinê... xwexapandin e, ma gelo... em çendîn car bi simbolên wek (em Misilman in û birayên hev in) û bi simbola komonîstî (navneteweyî û mafê çarenivîsa gelan) hatin xapandin, û niha jî bi simbola (biratiya gelan) em tîne xapandin, ma gelo kengî emê dawiyê bi vî piroseya xopanê, xapandin û xwexapandinê bînin?

“Ketî bi xebatê radiibe” ev pend ji bav û bapîran ve ji me re ma ye, erê birano, erê xwîşkino... em gelekî ketîne û bindestê sê neyarên hov û har in, û gellek caran em ketine, û divê ji ketinên xwe fêr bibin, wek çawa pêşiyên me gotine: “Her ketinek bi hebûnekê ye”. Têvî ku em xwedî



dîrokeke kevnar in, û xwedî çandeke rewşen û şarîstanî ne, lê dîsan em di bin gefa neman û bişaftinê de ne, aşên neyaran hebûna me dihêrin.

Na ji hemû reng, cûr û awayên xapandinê, rizgarbûn ji xapandin û xwexapandinê rizgarbûna gel û welat e, bes e ji hemû rengên xopanê re, belê çare tenê xebat e, xebateke bi wêrekî û bi jîrî, jiber ku jiyan hevrikiyeke bê dawî ye, û hevrikiya herî erênî û dijwar, hevrikiya bi xwe re ye. Wek Zeredeşt dibêje: “Kesê ku nikaribe raseriyê xwe be, wê tucarî nikaribe raseriya çî tiştê dî bike”.

Almanya, 04.09.2020

Nerîna Lîderan



“Mike Pompeo”:
“Amerîka bi ti awayekî îznê nade ku dorpêşa cebilxane li ser rejîma Îranê bê rakirin”.



“Ben Wallace”:
“Rejîma Îran ji rêya Hizbulah û Hûsiyan ve piştevanî ji terorîzmê dike”.



Xamineyî:
“Îmarata Yekgirtî ya Erebi bi cihana Îslamê xiyaret kir”.



“Mihemedbaqir Nobext”:
“Amerîka îzna firotina yek dilop neftê jî nade Îranê”.

Saziya Mafên Mirovan a Kurdpa, ew pêwîstiya ku diviyabû em lê mikur bîn



N: Eskender Ceiferî

Wek baktiriyên, saziyan ku xwe wek parêzvanên mafên mirovan binav dikin, berfireh bûne. Di vê navberê de piraniya wan, tenê ji bo pere hatibûn avakirin, ji xwe piştevaniya aliyên navdewletî ji bo çalakvanên mafên mirovan jî bûye sedem ku fikra bazirganiyê berfireh bibe. Bi awayekî ku kesek dirabe û malperekê ava dike, navê wê didanî sazî û ji no karên xwe, piştevaniya malî jî bi deşt dixîne. Lê belê pêwîst bû saziyên wek Kurdpa, ajar vedin û bibin dengê bînpêkariyên mafên mirovan li Kurdiştana Rojhilat.

Saziya Kurdpa ku ev çend sal in çalak e û îsal li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hate tomarkirin, di daxuyaniya xwe ya avakirinê de ragihandiyê: “Rewşa nebaş a mafên mirovan li navçeyên cuda yên Îranê û kiryarên deşthilatdariyê ji bo bînpêkariya zêdetir, berfireh û berdewam a mafên mirovan, bûye sedemeke girîng ji bo avakirina saziyeke mafên mirovan a serbixwe. Ew sazî wê hem nûçe û zanyariyên derbarê wan bînpêkariyan tomar bike û hem jî bînpêkariyan bişopîne. Saziyeke bi vî rengî, dikare li wan navçeyan ku saziyên din li wêderê çalak nîn in, perwerdeya mafên mirovan danî. Li ser vê bingehe jî Kurdpa wek saziyek ku ne li ser pêgeha berjewendiyê hatiye avakirin, piştî xwe bi hin rojnamevan û nûçegihanên pêşketî germ dike ku ji berê ve li hin ji wan navçeyan kar dikin lê belê ew kes hatibûn piştguxistîn. Saziya Kurdpa jî aliyê toreke çalakvanan ve ku ji heman navçeyan in, hatiye avakirin.”

Kurdpa ku ji aliyê şehîd Kawe Cewanmerd ve hatibû avakirin û heya niha jî di çeper û rêbaza wî de ye, ni awayekî xwebexşane ji aliyê kesên dilsoz ve ji bo doza Kurd û mafên mirovan li Kurdiştana Rojhilat bi awayekî bê beramber tê rêvebirin. Vê saziyê di beşeke din ji daxuyaniya xwe de tekez kiriye ku Kurdpa dixwaze kêmasiyan di warê nasandin û ragihandina bînpêkariyên mafên mirovan de qerebû bike û vê valahiyê tijî bike. Li ser vê rêbazê jî 3 xalên sereke hene ku Kurdpa xwe bi wan wefadar dibîne;

Xala yekemîn ev e ku saziyên mafên mirovan dikevin bin bandora siyasetê. Saziya Kurdpa, wek bingeha xwe ya sereke, hewl dide ji bo eşkerekirin û ragihandina bînpêkariyên mafên mirovan, ji siyasetê dûr be. Di vî warî de Kurdpa dixwaze serxwebûn û pêşketîbûna xwe biparêze û dûrî ramanên siyasî be.

Ev sazî, ramana xwe û enerjîya xwe, ji bo paraştina mafên



mirovan bi kar tîne ku di vê rêbazê de dehan qurbanî jî dane. Ne tenê rêveber û avakerê wê hate şehîdkirin, lê belê bi dehan rojnamevanên Kurdpayê jî çendîn caran ji aliyê dagirkar ve raştî givaşan hatin. Lê ji bo Kurdpayê, parêzvanîkirin ji mafên mirovan ji her tiştî girîngtir e. Lewma jî qet bixwe piropagende bi wan nekiriye. Kurdpa di beşa duyemîn û girîng a daxuyaniya xwe de ragihand ku: “Ramana Kurdpa, berpirs û hevkarên vê, tenê mijara paraştina mafên mirovan e. Lewma jî rênimûniyên navnetewî yên mafên mirovan, ji xwe re wek bingehe dibînin. Saziya Kurd dixwaze endamên xwe û kesên ku hez dikin, li ser hizra paraştina mafên mirovan perwerde bike da ku valahiyên di vê derbarê de tijî bike. Sedem jî ev e ku hizrên siyasî û nebûna baweriyê bi paraştina mafên mirovan wek bingehe, di nav nûçegihanên mafên mirovan de jî tene dîtî. Carna jî fikrên wan ên siyasî, netewî, olî û zayendî dibin sedema kêmbûna çalakiyên wan û herwisa dijatiya mafên mirovan.”

Ji xeynî van du xalan, saziya Kurdpa amaje dide xaleke din a herî girîng ku derbarê piştrastkirina zanyariyan e. Eger saziyek, hemû gotegotan wek nûçe belav bike, ne ew sazî dikare bibe cihê baweriyê û ne jî karê rêveberên wê, wek dilsozî tê binavkirin. Kurdpa di beşa dawiyê ya daxuyaniya xwe de dibêje: “Xala sêyemîn jî ev e ku saziya Kurdpa, zanyariyên xwe ji xeynî çavkaniya sereke, ji çavkaniyeke duyem jî piştrast dike. Em zêdetir di vê derbarê de girîngiyê didin nûçegihan, parêzer û wan çalakvanan ku ji berê ve di vê mijarê de çalak in. Ev pirose, ji bo me baweriyê li pey xwe ve tîne.”

Saziya Mafên Mirovan a Kurdpa, sala 2020'an li ser van 3 bingehan, li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatiye tomarkirin û çalakiyên xwe berdewam dike.

Rojavayê kurdistanê li ber man û nemanê ye



N: Ebdulazîz Qasim

Tevî dewlemendiya Kurdistanê Sûriyê “Rojava”, bi kanza û dermal û çavkaniyên xwezayî û bi çandiniyê û petrolê, ku li gorî raporteke berê ya rêxistina geşepêdana navdewletî ku berhemê salekî yê parêzgeha Hisiçe, têra xelkê Sûriyê bi qasî deh salan heye, herwisa ku vê dawiyê girêbestê ji bo zêdekirina berhemhêna neftê û saxbîrkirina kilîngehên petrolê di navbera kompaniya neftê ya Amerîkî “Delta Crescent Energy” û “HSD” de hate îmzekirin û di heyva bê 20.10.2020’an de bikeve di warê cêbicêkirinê de, û ev girêbest wê bibe derfeteke zêrîn bo xweşkirina jiyana hemwelatîyan û avakirina jêrxana aborî ya navçeyê û herwisa deriyan li pêşiya danpêdanê bi statuyek Kurdî vedike, tevî ku heta niha vê girêbestê ti kartêkirin li başkirina jiyana xelkê nekiriye, berovajî ku vê yekê metirsî li bal xelkê deverê zêde kiriye ji ber gef û nerazîbûna Tirkîya û Îran û rejîm û opozisyona Sûriyê û tevî PKK jî li dijî vê girêbestê.

Tê zanîn ku rewşa deverên Kurdî ber bi metirsiyek mezin ve diçe, û pêla koçberiyê careke din ji Kurdistanê ber bi Ewropa zêde bûye û ji ber şerê neh salan li ser Sûriyê û şerê dijî rêxistina terorîst ya “ISSI” û dagîrkariya dewleta Tirkîyê û çeteyên wê li ser Efrînê û Girêspî û Serêkaniyê, ku rojane bi dehan tawanên dijemirov û tawanên cengê li wan navçeyên dagîrkirî li dijî miletê kurd tene pêkanîn digel guhertina demografi û dizîna şûnwarên dirokî û şewtandina dariştanên Efrînê, û berdewam birîna ava vex-

warinê ya ji Serêkaniyê li ser bajarê “Hisiçe” ku jiyana nêzîkî 1 milyon mirovî hercar têxe di bin metirsiyê mezin de, hevdem digel belavbûna vîroşa korona û nebûna derman û dezgehên saxlemiyê bi awayekî pêdivî ku niha rewşa jiyana miletê kurd ya rojane ber bi karaşteke mirovî û trajdiyê xirab diçe.

Li aliyekê din, û li gorî malpera “Al-Araby Al-Jadeed” li roja 26 Tebaxê, ku di hevrikiyê mezin di hevdîtinekê de li Stemolê di navbera serokê opozisyona Sûrî Nasir Alherîrî û şandeya Amerîkî bi serokatiya nûnerê Taybet bo Sûriya, “Joel Raybrunn” de, ku hevrikiyê mezin di wê civînê de peyda bû, dema ku Alherîrî nerazîbûna xwe diyar kiribû li hember piştgiriya Amerîka ji hêzên HSD û ji lihevkerina kurdî-kurdî re.

Li gorî wê çavkaniyê ku “Rayburnn” bi hêrs bersiva Alherîrî daye û gotiye, berê xwe bidin Şamê, çima hûn berê xwe didin Hisiçe, û bal kişandiye li ser tawanên çeteyên opozisyonê li Efrînê û Serêkaniyê û Girêspî.

Dubare tevî rewşa mirovî ya metirsîdar, lê hin jî milet bêhêvî nebûye li hember pêkhatina tifaqa



kurdî û danûstandinên berdewam di navbera Encûmena Niştimanî ya Kurd û Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurdî de tevî vê dema kurt û dereng hin jî bala xelkê dikişîne, tevî cûdahiyên mezin di navbera her du aliyên kurdî de, ku tevî pêdiviya siyasî û netewî ya yekrêziya kurdî, hevdem îro me pêdivî bi vê yekê û bi rêveberiyek baş heye, ji bo rizgarkirina jiyana miletê Kurd yê hejar ji vê qeyrana mirovî ya kambax bi peydakirina av, nan, sotemenî, xwendin û tendirustiyê heye.



Civak di serdema Koronayê û li bin desthilatdariya hikûmeta olî û ola hikûmetî de



N: Elî Munezemî

Gava ku bas li olekê tê kirin, yanî bas li wan prensîp û raştiyan tê kirin ku di çarçoveya baweriya wî olî de bi raştiya mutleq tînin. Her li serdema hikûmetdariya Se-fewiyan heya îro rojê ola Şîe ku xetek li ola îslametiye ye, rolek mezin li sîstema desthilatdariya Îranê de hebûye û bandorek mezin li ser hemû aliyên jiyana xelkê ku di çarçoveya tixûbê siyasî ya Îranê de dijîn, daniye. Lê eva ku di wan 40 salên baviyê de pêdiviye meriv zêdetir bala xwe bide, şaxeya nû ya şîenîzm an ku Îslama Xumeynî ye; Bi wê wateyê ku eger li zêdetir ji 500 salan beriya niha de olek xasmanî wek ola fermî ji aliyê desthilatdaran ve hatibû destnîşankirin di Îranê de, îro rojê ew ola ji aliyê karbideştên rejîma Xumeynî ve dest bi ser de hatiye girtin û ew bi keyfa xwe çî prensîp û nirxekê bi hevce bizanin, lê kêr û zêde dikan. Aliyê nerênî yê bandora hikûmetê li ser ol di serdema nexweşiya vîrûsa koronayê de zêdetir derketin û bîrûraya giştî li her derê cîhanê de şaş û mehtel hêla.

Di demekê de nexweşiya korona bûye arîşe û gefek mezin li ser jîyan, aborî û ewheliya xelkê li her derê dinyayê û hukûmdarê her welatekê cehd dike li pêxema kêmkirina ziyar û zirara wê nexweşiyê li ser xelk û welatê xwe, rêkên dijwar daynin pêşîya xwe û xelkê xwe, rûtînê hişk yê saxlemiyê peyrew bikin û bi wê sedemê zor çalakiyên olî, çandî, werzişvanî û hunerî dane sekinandin û tûrîzma zaf welatan heya radeya ne-

manê jar û lawaz bû. Lê rejîma terorîst a Îranê ku li ser milê xelkê paremayî yê olî xwe ragirtiye û jiyana xelkê re çî nirx û buhayek dananê, ne tenê rêgirî li birêveçûna rêûresma «muherem»ê negirtin, lê «medah»ên hikûmetî erkdar kirin ku bo zêdetir rakîşandina xelkê bo nav rêûresman pişkdariya wan rêûresman bikin û bazara wî karî li caran germtir kin. Ew yeka jî dide eyankirin ku birêveçûna rêûresman bo bilindragirtina heşt olî ya xelkê, bi rejîmê re ji paraştina jiyana xelkê pêştirîti heye. Eva di demekê de ye ku li gor ola Îslamê jî, li metirsîxistina canê xwe yan yê kesek din cihê qebûlkirinê nîne û ew yeka gunehê mezin tê hesibandin. Lê mixabin di Îslama «Xumeynîstî» de hemû tiştê bo gihîştin bi armancê rewa ye. Jiber ku armanca karbideştê rejîmê, paraştina wê rejîma hovane ye. Li gor îdeolojiya wê rejîmê, azadiya xelkê di xwerealîzekirin û xwe helandin di nava nirx û buhayê destnîşankirî di aliyê rêberên olî yê wê rejîmê de ye û bo handana xelkê ji ola wan wek alavekê mifahê werdigrin. Propaganda û karbideştê rejîmê di pêxema serxistana wê pîlanê de, xwe li çî derev, kar û reftarek nemerivane naparêzin. Zaf çavkanî hene ku didne xuyakirin ku amar û statîkên rastîn a wî xelkê ku bi sedema vîrûsa korona di Îranê de tene weşandin, yek li sê a hejmara rastîn a wan kesan e ku bi sedema koronayê canê xwe jideştane.

Di merasima “Muherem”a îsal de eger çî Wezîrê Tendirûst yê rejîmê daxwazkiribû ku merasim bi liberçavgirtina rûtînê tendirûsriyê werin birêvebirin û cîyên olî yê giştî daxistî bin û destyên reşikdaran tenê li destyê xwe de şî û taziya xwe bi rê ve bibin û hatûçûna destyên din nekin û mesafeya civakî biparêzin, lê ew yeka qet nehate paraştin û çî organek dewletî jî cehd nekir ku



di pêxema paraştina jiyana xelkê de, hevkarîya xelkê bikin û birêveberê wan merasima hanbidin ku usûl û rûtînê hewce cîbicî bikin. Lê ew yeka bo dewleta terorîstî ne xem e. Jiber ku eger tiştê jî bê serê xelkê, yê guneha wê bavêjin stuyê Xwedê û yê dîsan bibêjin ku “bê îzna xwedê çî tiştê naqewim ye”. eva di demekê de ye ku Xwedê hiş û aqil daye merivan û ew yeka ye ku merivan li rihberê din cuda dike. Lê toza wî karî yê tenê here çavê xelkê. Pêdivî ye ku xelk bi giştî, peyrewê ola Îslamê hemû û bixasmanî şîeyên rastîn, xetê xwe li yê karbideştên paternalîst û despotî cuda bikin û nehêlin heştê paqij e oliya wan bibe alavê lîstoka oportonîstan û jîyan û ola xwe li gefa wan xwînmijan biparêzin. Ew yeka yê dinya û axireta wan li her demê zêdetir biparêze û di xizmeta wan merivanetiye de be.

Mela Ehmedê Namî pêşketina jinên Kurd ji xwe re kiribû armanc

Helbestvanê Kurd Mela Ehmedê Namî yek ji stûnên helbesta resen li Rojavayê Kurdistanê bû.

Namî di hemû helbest û berhemên xwe de, hewl dida gelê xwe bi pêş ve bibe, zimanê wî geş bike û keç û jinên wî azad û xwende bike da gelê Kurd jî cihê xwe di nav rêza gelên pêşketî yên cîhanê de bigire.

Namî êş û janên gelê xwe baş nas kiribû û digot: “Dibistanan bi lez çêkin, hepisxanan bikin wêran. Nemaze xwendinê pir kin, ji bo me her ev in derman.”

Lewma jî Namî di wê dema dijwar de, xwendin, paraştina zimanê kurdî û bi taybetî pêşketina keç û jinên Kurd ji xwe re kiribû armanc.

Di nîveka yekem a sedsala borî de, li gundê Tilşeîra Aşîta ku dikeve rojhilatê bajarê Qamişloyê dibistaneke keçan bi saya Namî hate vekirin. Keçên Kurd di wê dibistanê de fêrî xwendin û nivîsîna bi zimanê Kurdî dibûn.



Berî deşt bi xwendina xwe ya rojane bikin, şagirtên keç sirûdeke Namî digotin û paşê deşt bi xwendinê dikirin. Ev sirûd bi navê (Neşîd û Gaziya Keçan) di diwana Namî ya (Daxwazname)yê de cih digire, beşek jê wiha ye:

Birayên delal hûn werin xortino
Buhuşt e welat da'm herin merdino

Welat çav li rê bendewarê me ye
Ciwan herne pêş dewr û dem ya we ye

Dilê me ji pola ye gurçik hesin
Ji bo tol û doza welat em bes in

Eger hûn neyên vane keç em meşin
Bes in koletî serfiraz da'm bijîn
RÛDAW

Bêbuhar: Welat dagîrkirî be rûmet û namûs jî namîne

Yûsivê Berazî helbestvanê mêranî û fêrisiyê bû. Navê xwe kiribû Bêbuhar ji ber ku heta niha buhara gelê Kurd nehatiye û Kurd negihane azadî û serxwebûna xwe.

Di helbestên xwe de, Bêbuhar li ber mijarên wek welatparêzî, şiyarkirina millet, yekbûn û yekrêziya Kurdan û rexnekirina êş û nexweşiyên civaka Kurd disekinî.

Bêbuhar herdem hewl dida nîrxên rûmet, li hev xwedî derketin, pêşketin û paraştina ax û ziman di nav gelê xwe de, bi rêya helbet û berhemên xwe biçîne. Wî bawer dikir ku eger ev nîrx û biha di nav xelkê de nemînin, dê paraştina şeref û namûsa Kurdî jî zehmet û ne mumkin be.

Lê Bêbuhar di warê dîtin û ravekirina “namûsê” de xwedî dîtineke cihêreng e. Dibêje: “Namûs ne bes keç û jin in, welatê te namûsa te ye.” Wî hergav tekez dikir ku namûsa mîr û jinên Kurd ax û welatê wan bi xwe ye. Eger axa wan azad û welatê wan serbixwe û serfiraz be, hingê rûmet û namûsa wan jî paraştî ye.

Bêbuhar dibêje rûmet û namûsa min welatê min e û kesê bê welat be û welatê wî bindest û dagîrkirî be, wê çaxê ti rûmet û namûs jî jê re namîne.

Bêbuhar di helbestêke xwe de jî vê baweriya xwe tîne ziman û dibêje:

Xurtî ew azadî ye

Eger mirov pê bigire

Ê jî dijmin xurttir be

Dijmin li pêş wî dimire

Ew mirov bînamûs e

Ji bo namûsê nemire

Namûs ne jin û keç in

Namûs welatê we ye

Yûsiv Berazî di sala 1931ê


de li gundê Tilcîrcê nêzîkî navçeya Babê ya Helebê ji dayik bû û di sala 1954an de li Serê Kaniyê bicih bû û heta dawiya jiyana xwe li wir jiya.

Ew wek helbestvanê klasîk yê dawî li Rojavayê Kurdistanê dihat hejmartin û bi zimanê xwe yê resen û zelal deng dabû.

Ew ji Berazên deşt Pîrsûsê (Sirûcê) bû, ji ber vê yekê paşnavê xwe kiribû Berazî.

Ji ber ku ew Kurd bû û hêj milletê Kurd buhara azadiyê nedîtiye, Yûsivê Berazî navê “Bêbuhar” li xwe kir û pê hat naskirin.

Berî 11 salan, di 15.01.2009an de helbestvanê Rojavayê Kurdistanê yê bi navûdeng Yûsiv Berazî ku wek Bêbuhar dihat naskirin, li bajarê Serê Kaniyê koça dawîn kir û her li wê derê bi axê hat spartin.



Bêbuhar:
Namûsa mirov welatê wî ye

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Di Kurdiştanê de her roj xelk dibe qurbaniyê nan

Çar kasibkarên Kurd yên xelkê bajarên “Serdeşt” û “Pîranşar”ê di encama teqeya hêzên Întizamî de, hatine kuştin.

Şeva Sêşemî 1ê Îlonê, kasibkarekî Kurd yê bi navê “Celal Xizrî”, xelkê gundê “Zêwe”a girêdayê bajarê “Pîranşar”ê, bi teqeya rasteraşt a hêzên serkutker yên rejîmê hate kuştin.

Herwisa roja Çarşemî, 2ê Îlonê, kasibkarekî din yê bi navê “Zanişt Hesennijad”, 25 salî, xwediyê malbatekî 7 kesî û xelkê Bajarê “Serdeşt”ê, li ser sînore “Qelate Reş”ê, di encama teqeya hêzên rejîmê de, hate kuştin.

Li berdewamiya kuştina kasibkarên Kurd yên ku di encama teqeyeyên rasteraşt yên rejîmê de tene kuştin, li roja Çarşemî 2ê Îlonê, 2 kasibkarên din yên bi navên “Sirûş Melkarî” û “Zanko Ehmedî”, xelkê bajarê “Serdeşt”ê, hatine kuştin.

Welatîyekî Kurd di girtîgehê de çarenivîsa wî nexuya ye

Welatîyekî Kurd yê bi navê “Rehman Rehîmpûr” xelkê bajarê Seqizê, di girtîgeha hêzên ewlehî de ye û qedera wî nexuya ye.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew welatiye di dema binçavkirinê de tenê carekê digel malbata xwe pêwendiya telefonî girtiye û malbata “Rehman” li rewşa kurê xwe agehdar nînin.

Wê çavkaniyê di berdewamiyê de got: “Ew welatiye bo lêkolînê bo îdareya îtila`ata bajarê Sineyê hatiye veguhaştin”.

Herwisa wê çavkaniyê bas kir, hêzên ewlehî ragihandine ku heya dawîhatina heyama lêkolîna wî, dosiya wî di girtîgehê de radi-grin.

“Rehman Rehîmpûr” roja Çarşemî 22`ê Gelawêjê, di parka Lale ya bajarê Seqizê de, bi bê hebûna belgeya yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

Hêzên ewlehî ew welatiyê Kurd bi tohmata “alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd yên dijberî hikûmeta Îranê” binçav kiribûn.

Hêzên ewlehî piştî binçavkirina wî welatiyê Kurd êrîş kiribûne ser mala navbirî û deşt bi ser lebtaba wî de girtibûn.

Welatîyekî Kurd li bajarê Şîrazê hate binçavkirin

Roja Înê 7`ê Xermananê, welatîyekî Kurd yê bi navê “Mehdî Îbrahîmzade” kurê “Îbrahîm”, temen 37 sal û xelkê bajarê Serdeştê, li bajarê Şîraz a ser bi parêzgeha Fars, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin.

Ew welatiyê Kurd bi bê hebûna belgeya yasayî hatiye binçavkirin û piştî bo cihekî nexuya hate veguhaştin.

Pêka gotina çavkaniyekî agehdar, wî welatiyê Kurd ola xwe ji bîslmanetiyê ve bo ola mesîhiyetê gohirî ye û bi wê sedemê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin.

“Mehdî Îbrahîmzade” xwediyê Jin û 2 Zarokên 7 salî û 1 salî ye.

di heyama çend rojên derbas bûyî de welatîyekî Kurd yê bi navê “Şêrko Siyavoşî” kurê “Mihemed”, temen 37 sal û xelkê bajarê Serdeştê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hetibû binçavkirin û bo cihekî nexuya hatibû veguhaştin. Wî welatiyê Kurd jî ola xwe bo ola mesîhiyetê gohirî bû.

Sê welatiyên Kurd yên xelkê bajarê Mihabad û Sineyê hatine binçavkirin

Roja Înê 14`ê Xermananê, du welatiyên Kurd yên bi navên “Silêman Kerîmpûr û Xalid Mihemedzade Eqdem” xelkê gundê “Xurxure” a ser bi bajarê Mihabadê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Ew du welatiyên Kurd, di demekê de ku di nav zewî û hasila xwe de mijûlê kar bûn hatine binçavkirin û bo cihekî nexuya hatine veguhaştin.

Heya niha lipeyketina malbata wan du welatiyên Kurd, bo agehdarbûn ji qeder û cihê ragirtina kurên xwe bê encam mane. Heya dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wan du welatiyên Kurd de hatî sepandin, ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.

Ji aliyekî din ve, di heyama çend rojên derbasbûyî de, welatîyekî Kurd yê bi navê “Sabir Salihî” xelkê bajarokê “Hesenava” a ser bi bajarê Sineyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin.

Binçavkirina wî welatiyê Kurd, bi bê hebûna belgeya yasayî bûye û ji sedema binçavkirina wî, ti zanyariyek ji bere deşt de nîne.

Hikûmeta Fransayê dîroka Kurd û Pirs Kurd dixwe nav programa xwandina lîseyê

Hikûmeta Fransayê dersek derbarê dîroka Kurd û Pirs Kurd de dixwe nav programa xwandinê ya pola 11 a qonaxa lîseyê. Ders di pirtûka dîrokê û cografyayê de hatiye danîn û navnîşana dersê jî, “Kurd: neteweke bê dewlet e.”

Vejîna hêviya serxwebûnê

Di naveroka wê dersê de hatiye, ku Kurd mez-intirîn netewa bê dewlet e li cîhanê û hejmara wan nêzikî 40 milyon kes e û piraniya wan li ser mezhebê Sunne ne. Herwiha di wê dersê de hatiye gotin: Sed sal e ku beşek ji Kurdan ji bo Kurdistanê serbixwe têkoşînê dikin û ew dewletên beşek ji Kurdistanê ketiye nav sînorê wan, li dijî wê hewldanê radiwestin, lê rûxana rejîma Seddam û herifîna Sûriyê, hêviyên ji bo avakirina Kurdistanê serbixwe vejandine.

Di birgeyeke din a dersê de pîrsek wisa hatiye kirin, “gelo milmilaniyên Rojhilata Navîn dibin sedema çêbûna dewleta Kurdî?”

Pêşmerge

Di birgeyeke din de behsa rola hêzên Kurdî di têkbirina DAIŞê de dike û têde behsa rola Pêşmerge hatiye kirin û hatiye nivîsandin: “Wateya Pêşmerge di zimanê Kurdî de wate ewên rûbirûyê mirinê dibin. Hêzên Pêşmerge heman rewşa serbazên Iraqê hene, ew yek ji piştî şerkirina li dijî Seddam Hisên û şerkirina li dijî Dewleta Îslamî ya DAIŞê bidestxistin. Ew yekîne di sala 1920an de hatine avakirin û niha hejmara wan nêzikî 350 hezar şerkeran e.”

Dagîrkirina Rojavayê Kurdistanê

Herwiha di wê dersê de behsa biryara Serokomarê Tirkîyê Recep Tayyip Erdogan hatiye kirin, ew biryara bi rizamendiya Trump hat dayîn di 9ê Cotmeha 2019 de, bo êrîşkirina li ser Rojavayê Kurdistanê. Herwiha şerê DAIŞê weke destpêka hevkarîya navbera Amerîka û Kurd li Sûriyê hesibandîye, kuştina Serokê DAIŞê jî giringiya wê hevkarîyê nîşan da, herwiha dibêje, ew destpêka dagîrkariya Tirkîyê jî bû li ser welatê Kurdan li Sûriyê, û di wê beşa waneyê de wiha hatiye nivîsandin, “Dawiya Kurdistanê Sûriyê: Di 9ê Cotmeha 2019 de, Serokomarê Tirkîyê Erdogan bi razibûna serok Trump êrîşeke serbazî li dijî Kurdan li Sûriyê destpê kir. Ew jî dawîya hevkarîya navbera Wîlayetên Yekgirtî yê Amerîkayê û Kurdên Sûriyê bû – Ew hevkarîya operasyona li dijî Serokê Dewleta Îslamî giringiya wê nîşan da- û herwiha destpêka dagîrkariya Tirkîyê bû bo ser welatê Kurdan li Sûriyê. Piştî topbaranê, artêşa Tirkîyê tankên xwe û axa xwe da dest birîkarên xwe .., wan grûpên çekdar jî bi piranî ji çeqokêş yan cîhadî yan jî çeqokêş û cîhadî di heman demê de – ji wan erebên Sunnî


pêk hatine ku ji Kurd û Krîstiyanan hez nakin, ew pêştir jî çekdarên şaxê navxweyî yê rêxistina El Qaîdeyê bûn.”

Efrîn

Herwiha birgeyeke din a dersê behsa Efrînê dike li Rojavayê Kurdistanê û di vê birgeyê de hatiye nivîsandin: “Em nikarin bêjin em agahdar nînin. Di Adara 2018an de artêşa Tirkîyê navçe û bajrê Efrînê yê piranî Kurdnişîn dagîr kir. Ew navçe jî radeştî komên cîhadî hatiye kirin – ku mafê birina hemû tiştên destbiserdegirtî hene. Çekdarên wan milîsan, mal û gelek dikanên Kurdan talan kirine. Dest bi revandinê bo wergirtina fîdyeyê kirine û kuştina bikom encam dan, bêtî ti dadgehîkirinekê. Niştecihên Kurd reviyên 130 hezar kes avêtin ser cadeyan, ew jî armanca pêkhatî ye, çimku armanç, dawîanîna bi hebûna Kurd e, li ser xeta sînorî ya li gel Tirkîyê.”

Spasiya Trump bo Kurd

Herwiha birgeyeke dersê ji bo rola Kurd li Sûriyê di têkbirina DAIŞê de



hatiye terxankirin, “Kurdên Sûriyê yekemîn hêz bûn ku Dewleta Îslamî têk birin û Bexdadî ji paytexta wî ya Sûrî li Reqayê derxistin. Bêtî wan ku di vî şerî de 11 hezar qurbanî dan, Trump nedikarî ahenga serkeftina bi ser Dewleta Îslamî de bigêre. Bi şewaza xwe jî spasiya Kurdan kir: Bi rêya radeştkirina wan bi hinek cîhadiyên din.”

Di dersê de hin pîrs li xwandekaran tên kirin, weke:

Gelo rewşa Kurdan di hemû dewletan de weke hev e?

Gelo serxwebûn tekane rê ye ku Kurd dixwaze, her wek ku di destpêka salên 20î yê sed sala bihorî de hewl bo dida?

Rola Kurdan çî bû di şerê dijî Dewleta Îslamî de?

Çima em dikarin berawirdê di navbera rewşa Kurdên Sûriyê û Kurdên Iraqê de bikin?

Sala xwandinê ya qonaxa lîseyê li Fransayê ji nîveka vê heftiyê ve destpê kir. Bi hezaran xwandekar li Fransayê wê dersê li ser dîroka Kurd û doza Kurd û xebata gelê Kurdistanê dixwînin. Herwiha derbarê rola Kurd di têkbirina DAIŞê de dixwînin.

Hejmara wan xwandekarên di sala 2019 de li Fransayê qonaxa lîseyê xwandine, 755 hezar û 900 kes bûye, ku %51 ji wan xwandina giştî xwandine, %21 ji wan xwandina teknîkî û %28 ji wan jî xwandina pîşeyî xwandine. RUDAW